HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Dr. Birahîm Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Dr. Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Heîc Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

Pîstî helbijartinan Kerkûk li hêviya careseriyê ye	**SERGOTAR**	**92**
Islam û Pîrozî û Demokrasî û Afret	**Pîr Rustem**	**89**
Çareserikirna pirsgirêka kurd bi guhertina hizrên leşkerê tirk girêdayie	**Demhat Hezexî**	**85**
MEDYA Û BERNAMEVANÎ	**Denız Dargul**	**82**

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (12000) Dînar
Kesan (10000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (6000) Dînar
Kesan (5000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

sergotar

Pîstî helbijartinan Kerkûk li hêviya careseriyê ye

Pirsgirêka kerkûkê biyavekî ferehe di mêjî û dilê meliyonan ji kurdan û xwedan wijdan ji îraqiyan, ku komeke rastiyan bi xwe ve digire mina ku bi xwe parçeke cogirafiya û pêk ve girêday bi gewdê kurdistanê û jê parce nabe, sererayi hewlên pareçe kirinê û belav kirina bajar û bajêrk û gundên wê li ser parêzegehên derdor, dîsan nebûna xwendineke dîrokî cuda ji ketwarê kurdî yê giştî li îraqê mina ku bi rûpelên dîroka Kevin de û berhemên gerokên rojava û rojhilat nasa de hatiyeû wisa jî dîrok nivîsên misilman ji areb û kurd û tirkan, dîsan jî "pirsgirêka Kerkûkê" bûye armanc di dirêjahiya dîroka nû de û bajar û xelkên wê û derdora wê mîna hemi xelkên kurdistanê ji bû şer û cengan û kiriyarên pêşwext ji bû cuda kirina kerkûkê mina senter û bajêr ji hemi deverên dîtir yên parêzgehê wek rêk xweşker bo cuda kirina wê ji herêmê û derdora xwe ya kurdî ew jî ji ber gelek egeran , petrol, ku babetekî îstiratîcî û netewiye bi pila yekê, û nijadperêz bi pila duyê, û hiştine hokarên ne tenahiyê di navbera pêk hatên deverê û ne aramiyê bi pila sisiyê, eve bi aşikirayî li jêr sîbera bi rêvebiriya Osmaniyan ji çerxê şazdê de diyar bû dema berv dagîr kirina îraqê de çûy di rêka kurdistanê re ta ku bigihe

Bexdad û Kendavê, çimkî ji ber pêdiviya ewlekariya xwe gihandina Stenbûlê bi başorê Îraqê re di çûn û hatina leşkerî û bazirganî pêwîst bu wan rêkan da bin bike bi rêka ava kirina zargeha serbazgeha di dirêjahiya reka Zaxo an Heleb-Musil-Kerkûk-Bexdad û anîna xêzanên turk bû akincî bûnê û zêde kirina tenahiyê li çend senterên bajirvanî yên kurdî li ser rêka gişti û bi taybetî kerkûk, rijêmên netewî yên şofînist li îraqê û pîştî damezirandina dewleta Îraqê ya nû û bi taybetî rijêma partiya beas li ser şopa osmaniyan çûn ji bû bicih anîna heman armancan lê bi şêweyên karîgertir û kiryarên çav sorî û faşistî mina kiriyarên ji navbirina gişti û kuştina bi kom û koçber kirin û guherîna netewî û kiriyarên areb kirinê, îraqiyan û cihanê hemiyê ev dokoment û kiriyar bi çavên xwe dîtin piştî Ruxiyana rijêmê.

çi pê nevê û mîna tê zanîn di zanistê ramiyariyê ko bi nemana daneran encam ser ji nû têne darîştin bi taybetî heger encamp verêja zordariyê û bi hêza tifengan û tirsa desthelatên diktatoryetê derketibin[piştî ruxyana faşîzmê û naziyetê li Ewrupa çavxişandinek li ser her tiştî li Elmaniya û Japonê û Îtaliya bigre ji destûran û yasayan û rêveberiyan û cugrafiya û heyanî bi dîrokê ser ji nû hate nivîsîn û hemî kiriyarên guherînan demogirafî hatin rawestandin û zulim li ser tuêj û kesan hate rakirin û hatine qerbo kirin li ber çavên gelê wan welatan û bi serpereştiya hevpeymanan û netwên yekgirtî û bi rêka dadigehê, bi heman şêwe ev kiriyar li welatên kempa sosiyalîst ya berê û başûrê Afrîqa piştî rûxiyana rejêma nejad perst hatine encamdan. Pirsiyara li ber dest ji nîsana 2003 û heta niha ewe: çima dûbare lê nerînek di kiriyar û pilanên rejêma Behsa nejad perest nayê kirin, bi taybetî li deverên kurdistanê yên ku hatine areb kirin û bi taybetî Kerkûk? Kî berpirsiyare ji ne bi cih anîna berga 58 ê ji yasa bi rêvebirina dewleta Îraqê ya girêdayî vê pirsgirêkê ko daxwaza asayî kirina rewşa Kerkûkê dike? Erê egerê ne lezkirinê û pişt guh avêtinê ewe ko kurd dixwazin bi rêkeke aştiyane û dadperwerane çareser bin û dûr ji tund û tûjiyê? Yan jî hinek di hukumeta Îraqê de hene çi netewe perestên şofînist bin yan ol û mezheb perest bin

ko dixwazin mîratê behsiyan li kurdistanê bi parêzin!! û li deverên ji bin bibin?

Bi vî awayî aramî û hedara gelê kurdistasnê û bi taybetî yên ziyan lêketî dê gihê sînorê xwe.

Gotara siyasî ya kurdan û hêzên wan yên netweyî û nişţîmanî xuyaye sebaret pirsigirêka Kerkûkê, serrayî hemi rastiyên dîrokî û cogirafî û babetî ko kurdistanî bûna Kerkûkê berceste dikin mina baja û parêzgeh û dever, dîsan jî qayil bûn bi heme rengiya netweyî û çandî û bişkidariyê di navbera hemi pêkhatan de ji kurd, turkman, ereb,keldan, aşûrî û ermen.

Dîsan jî penabirin bo dad û yasayê û encamên serjmêriyê û boksên dengdanê di mijarê rêvebirinê û karan û milikçiya erdan, herwiha jî serokatiya herêmê û bizava siyasî ya kurdistanê li ser wê yekê rêkeftîne ko bajarê Kerkûkê wêneyekî biçûke ji Îraqa hemereng bi netwe û ayin û mezheb û çandên xwe.

Hukumetên demoqiratên Îraqê li ber taqîkirinê ne ko diyarkin bê Karin vê arîşê çareserkin bi şêweyên aştiyane û bi rêka komîta bilinda asayîkirina rewşa Kerkûkê ya ko bi serokatiya- Hemîd Mecîd Mûsa – ye, ko heya niha jî çi pişţevanî di her warekî de lê ne hatiye kirin ji aliyê hikumeta Îraqê wek serokê komîtê daye xuyakirin.

Serkeftina komîtê di erkên xwe de dê rêkxweşkerek bê di çareser kirina hemi kêşên nişţîmanî yên Îraqê û dê biniyatekî mukum danê di warê peywendiyên kurd û ereban û netweyên din yên Îrqaê û dê Îraqa demoqirat û federala nû avakê mina nimûneke guherîna demoqirat di çareser kirina doaza netweyî li rojhilata navîn.

Islam
û Pîrozî û Demokrasî û Afret

Pîr Rustem

Islam û Pîrozî :

Çima ramyariya Islamî nikare ji dîroka berî (1500) sal derkeve û çi dihêle ku, mirovê misliman û di her tiştê xwe de bawkiya ewên pêşî bike. Ango, çi dihêle ku, ew ji dîroka îro bireve û bizavên xwe bike ku, li gor rabûn û rûniştinên dema "Pêximber" û jiyana wê çaxê bijî.

Û eger ku, karibe dê zorê li "Yê Din" jî bike, da ku ew jî li gor wê dema berê jiyana xwe nîgar bike.

Li gor dîtina me, bersiva pirsên çûne di gotin û têgihêştina "Pîroziyê" de ne; Ewa ku hêştiye deqa Quran ê û piştî şikandina pûtên hundir Kaibê, bi xwe bibe pût û li pêşiya her guherîn û pêşketineke nuh bibe kelem û rê li ber her zîrekiyekê bigre ku, ew di herî û kevza wê golê de bête fetisandin.

Bi gotineke din; Eger ku, tu banekî ji xwe re deyne, dê tu yê nikaribî stêran bibînî.

Û mixabin deqa Quran ê, ji fikir û ramyariya Islamê re, banê herî bilinde û gihîştî pileya ku, em wê weke jêdera her zanyariyekê, afrandinekê bibînin.

Ango û li gor ramyariya Islamê, ew; Deqa Quran ê jêdera evê zanyariya me ya îro ye û her afrandinek û pêşketinên di hemû waran de, ji wê deqê hatine wergirtin û wilo ew gihêştine ewê baweriya ku, dibêje: Xweda bi her tiştî dizane û wî ew zanyariya xwe xistiye hundirê wê deqê û tiştê ji me têtе xwestin ku, em wê

şîfrê vekin. Û wilo ew evqas çalakî û bizavên mejiyê zanyariyê ku, ji sedê salan de li Ewropa dest pêkirî, ji bîr dikin û hemû berhemên wê li piş guhê xwe dihêlin.

Mêjiyekî ji va ton-rengî ku, her tiştî di "Pûtê" xwe de dibîne. Ango, her tişt ji wî re amedeye û Xwedê ji pêşî de hemî zanyarî xistiye wê deqê û bi ser de jî evên din; Ewropî ji me re kirine kole û xizmekar ku, ew mejiyê xwe biwestînin û bi şevûroj çalakiyên xwe bikin da ku, afrandin û têknolociya nuh bi pêşxînin û ewana têxin raja me muslimanan, dê bihêle xewa me dirêjtir bibe û helbet kesên ku, ev baweriya wan be, dê ti carî mejiyê xwe newestîne ku, ew jî bibe xwedî fikir û zanyariya nuh û emê "Efsana Gilgamiş" weke rasteqîneke dîrokê bibînin.

Islam û demokrasî:

Islam dijî dengê yê dine û ew şerê yê ku rêza kerîderkeve dike û hertim bang li gotina yek û obetiya pêrewên xwe dike ku ti kes ji nav dernekeve û gotineke cuda, mêjî û ramaneke dîtir nenasê .

Û di vê derheqê pir ayet û gotinên Mihemed hatine ku pêrewên xwe ji piş xwe berdane; « Destê Xwedê li ser obêye, û şeytan bi dijî yê obê re ye » .

« Rawestina li ser şopa yên pêş, çaktire ji çalakiya di afrandinê de » . « Ewê Ku rûmeta xwediyê Aferînan bigre, alîkare di herifandina Islamê de»....û hw.

Ev ton perwerde helbet dê rê nade yê din ku dengê xwe derîne û pirbûn û zengîniyekê têxe nav civakê û ewê bihêle ku rê li pêş ên weke S . Husên û hemû diktatorên rojhilat ku li pê şopa nimûneya herî balkêş; Li pey Xewda, herin û nehêlibin ti dengên din di keşwara wan de hebe . Lewre û li gor vê baweriya Islamî û konevaniya ku li ser tête avakirin dê ev welatên me, ji demokrasiyê re, bibin goristanên rasteqîn ku ticarî kes newêribe nêzîkî wan xêzên sor bibe .

Û eger ku yek bêje ka ev konseya pirsdariyê « » bi çi merem û agahiyê hûn lê dinerin û ew ne rengeke ji yên

demokrasiyê . Heya gihîşt ku hin berevanên Islamî derkevin û bê dudilî bêjin ku demokrasiya îro li Ewropayê tête meşandin bingeha wê ji cem me ye, weke her tiştekî din, û di pêşiyê de me demokrasî naskirîbû . Li gor dîtin û baweriyên me ev çewtiyeke ji yên ramyariya Islamê, weke pirekên din, ku tiştan berevajî dike.

Ji berî hertiştî zarawa demokrasiyê bi civakeke nuh ve û ew ji berhema civaka sîvîle û ti tişt wê nakşîna civaka eşîrtiyê . Xala din jî ku gotina wan li wan vedgerîne, zaraw û rengê ku ev gotina pirsdariyê « الــشورى » û damezrandina wî konseyiye ku, li ser bingeha weke me gotiye, di destpêka vê gotara xwe de; Ku çênabe kes ji nav obeyê derkeve û dengekî cuda hebe û ev bi xwe dijî zarawa demokrasiyêye û wê ji binî ve hilweşîne .

Lewra eger ku em weke kes û civak bixwezin ji vê nesaxiya tenêtî û rêjîmên diktatorî rizgar bibin û rê li pêş evên ku di hundirên xwe de pir nexweşiyên derûnî hildigrin bibirin, gereke ev bingeha me ya ramyarî, ku ola Islamê stûn û kaniya herî mezine eger ku em nebêjin a herî bi tenê ye, bête guhartin û gereke weke ku çawa şaristaniya Ewropî karîbû cudahîkê têxe navbera ol û civakê, divê cîhana Islamî jî bide ser wê şopê û eger ku em bi vê gavê ranebin em hertim koleyên van zaraw û diktatoran bin .

Islam û Afret:

Eger ku, em bixwezin cihê pîrekê di civaka berî Islamê de binasin, dive ne tenê em vegerin pirtûka Quranê û nivîsandinên mislimanan li ser evê mijarê, ji ber ku, ewê bihêle tenê em nirîn û dîtinên pêrewên Ola Islamê bixwînin û da ku, em di têgihêştina xwe de şebkorî dernekevin û tenê bi çavekî li çêrokê nenirin, gereke em vegerin û li rewşa wê ya ji berî mislimantiyê jî binrin. Lê mixabin û ji ber ku, kêmjêderên wê çaxê dihêle pêrewên Ola Islamê dengê xwe bilind bikin û bibêjin ku, di wan deman de Qureyşiyan keçên xwe; Zaroyên nuh ji dayîka xwe dibûn, binax dikirin û ew ji bîr

dikin ku, yeke weke Xedîce; Jina Mihemed a pêşîn jî yeke ji yên wê civakêye û wê hêşt Mihemed bibe Mihemed. Ev dîtina, çêroka Taha Huseyn bi bîra mirov tîne ku, çawa pir ramyarên Ereb û ji bo ku, cihê Ola Islamê bêtir berz bikin, ew li qonaxa berî mislimantiyê divegerin, wê reş dikin û di bin navê "Nezaniyê" de didin naskirin. Tevî ku, helbestvanên Ereban ên herî bi nav û deng ên wê qonaxê ne û ew ji bîr dikin ku, çandeke bilind û rewşeke aborî xûrt weke ya Mekê li ser nezaniyê ava nabe. Vêca û eger ku, em vegerin wan xal û nimûneyên di derheqa evê mijara me de ku, ji qonaxa berî mislimantiyê ji me re ma ne û wan bidin xwendin û vekolîn emê binasin ku, pîrekê û bi hatine ola nuh re hinek tişt bi dest xistin, lê pir tişt jî winda kirin; Erê wê karîbû û bi xêra ola nuh û di aliyê aborî-civakî de hinek destkewtinan bigre, lê di warê azadî û serbestiya jinê de, civaka nuh pir sînor û xêzên sor danîn pêş wê û nemaze di têkiliyên toxmî de û civaka nuh bêtir ber bi nêrîtiyê ve ajot. Bi gotineke din; Ola Islamê û bi yek car civaka mêyîtiyê xiste gorê û eger ku, tenê em li guhertina Xwedayekî nêr bi ewqas Xwedayên din û nemaze yên mê weke; Lat û Munat û ne pejirandina guftûgoya Quranê ji ewan pêrewên mê re û pir bendên ku, bi xwendevan dide naskirin; Jin parsiwa kême û ew nikare weke mêran be, bi me dide naskirin ku, nirîna Islamê li afretê çawa ye.

Û eger ku, em van hemû tiştan jî bidin alî û yek bibêje; Ew ji netêgihiştina we hatiye û Ola Islamê wekheviyek di navbera jin û mêran de çêkiriye, em wî divegerînin rewşa pîrekê di serdema îro de ku, çawa ew weke koleyekê di civaka mislimantiyê de tête danasîn û dihêle em li ser wê bingehê pêre bidin û bistînin û me ew ji her tiştî bê par kirî û ne tenê wilo, lê û ji roja pêşî de me ew kiriye yek ji sermiyanên xwe û wê didin kirîn û firotin.

Çareserikirna pirsgirêka kurd bi guhertina hizrên leşkerê tirk girêdayie

Demhat Hezexî

Xwendevanên hêja û birêz yên kovara hawara nû bila ev car nivîsara me li ser rewşa bakurre kurdistanê be ji ber ku her çendî pirsgirêkên her parçeke kurdistanê bi merçen ku yên hindirîn ve girêdayiye, lê di kakilê pirsgirêka kurd de, çi nêzîk û çi dûr hemi pirsigirêk bi heve girêdanyine û raste rast bandore xwe li ser hev dikin. Ez di vê baweriyê de me ku, rewşa herêma kurdistana azad yê bandoreke xwe ya erênî li ser parçên din yên kurdistanê bike. Lê, giranî em ê li ser nêzîk bûna destihatiya tirkiyê ji pirsgirêka kurd re rawestin.

1- avakirina kopmara tirkiyiê:

Gelek dewlet li ser dînemîkên xwe yên hinder hatine damezirandin. Bê goman ew dewletên li ser hêza xwe ava bûy, bi rewsa aborî, siyasî û hizirî ve girêdayie. Lê, bervajî vê yekê, hin dewlet jî dînamîkên xwe yê derve ve ava bûne yek ji van dewletan komara tirkiyê ye. Hin kesayetiên ku li welatên ewropa xwendî û hizrên ewropî hemê kirî bi vî karî rabûn. Yek ji wan mustefa kemal bû ku yarmetî ji ewropiyan wergirt bu û li gorî vê bernameyên xwe amide kirin û komara tirkiyê damezirandin.

Biriyara ava kirina komara tirkî li lozanê hate dayîn, bê ku tu netewe, hindikayî û mezheb û çandên cûda cûda bibînin bingiha vê komarê danîn û gotin (her tişt ji bû tirkîtî û tirk bûnê). Û hemî jiyan, biriyar, hizir û yasa ketin destê artêşê û artêş bû tasa serê komara tirkî. Êdî di hemi waran de eydolojiya Kemalîzimê derkete pêş û derbasî nava xwîna wan bû. Naveroka vê eydolojiyê jî eve ye: nr qebûl kirina netewan, çand û hizir ji dervey tirkîtiyê, biçok dîtina hemi netewan, şofînîst, xwe mezin dîtin û komkujî û asîmlekirina gelane. Lewma heta roja îro nikarîne di warê demokirasî û jib u başiya civakê pêngavekê bavêjin. Ji alyek din ve, di tirsin eydolojiya Kemalîzimê qels û

lawaz bibe!

2- eydolojiya dewleta tirkî û astengiyên di riya guhertinê de:

Astenga li ber çavtirîn ya li pêşberî guhertina li tirkiyê eydolojiya fermiye. Bê goman li ser rozemîna cîhan mirovatiyê tenê du eydolojiyê sereke hene, yek ya îdîalîste û ya din jî meteriyalîste, bi şêwazeke din du hizir hene, yek mirovayetiyê ber bi ronahiyê ve dibe û ya din jî mirovayetiyê ber bi tariyeke kûr ve dib, lê, ya girîng ewe ku eydolojiya li ser stûnên zanistê kakil girtî û li gorî demê bi zimanê ramiyarî derbasî jiyanê bibe. Em werin ser eydolojiya fermî ya tirkiyê, ev eydolojî îdîalîste û ji vê zêdetir tenge, tariye û dixwaze civakê di nav tariyê de bixendiqîne! Ji bilî tirkan û tirkîtiyê tu tiştên din nas nake û tirkan li ser hemi gelan re dibîne, xwe paqij dibîne û yên ji derveyî vê riyê kirêt dibîne, heta dawî ev eydolojî teqlîde û li ser dînamîkên xwe kakil teşe ne girtiye. Dema mirov li van sirûdan(tirkek bedelî cîhanê ye! Xwezî ji wan kesan re ew ê diberejin em tirkin!) dinêre, bi awakî zelal û vekirî naveroka eydolojiya fermî ya kemalîzimê diyar dibe, lewre jî, evê eydolojiyê tu carî kurd, ermenî, suriyan, rom, tirkuman û laz qebul nekirine û tim xwestiye ewan di pişaftinê(asîmle) re derbas bikin.

3- komara turkiyê tu carî kurd wek kurd qebul nekiriye lê ew wek tirk qebul kirine:

Dema rastiya eydolojiya fermî eve û zimanê ramiyariya xwe sor û sipiye, bê goman yên gelê kurd nayê qebûl kirin. Piştî serhildana Sêx Seîd, Akirî û dêrsim bi xwînê hate fetisandin, bi giştî êrîşeke sipî(helandina kesayetî, çand, hûner û ziman) anîn ser kurdistanê. Di sala 1980 û şonde ev êrîş dijwartir bû, an ku kesayetiya kurd anî asta ku bibe dijminê xwe û eydolojiya fermî hemêz bike!. Dewleta tirkiyê tu carî wek kurd li kurd ne nêriye, lê, gelê kurd wek tirkê çiyan yên şikaftan û paşed may ditiye, bi vî rengî xwestiye kurdên bakurê kurdistanê durî rastiya kurd bikin, pir caran dengên li dijî vê nêzîk bûnê bilind buyine jî, yan kuştiye, yan jî avêtiye zindanê û gotiye:(win tirkin win çawa li dijî xwe radibin…)

4- her çend gelek rêxistin û partî rabûn jî lê heta roja îro komara tirkî ew qebol nekirine:

ji dema komar hatiye damezirandin û heta roja îro gelek rêxstin, kom û partî li ser qada siyasî, cekdarî û hûnerî tekoşin li darxistine, lê komara tirkiyê ew tu carî û bi tu awayî qebul nekirne û li hemberî wan hemi cureyên hovane bi kar aniye.her çende îro komara tikî bi navê dimokirasî û azdiyê bang dike jî lê

biriyar û çarenûsa komarê di destê leşkeran deye û leşker jî xwe parêzavanên hizrên Mustefa Kemal dibînin, Mustefa Kemal û hizrên mustefa kemal jî ne qebûl kirina gelê kurde!.

Carcara rêxistinên şoreşger yên çepên tirkan xwe nêzî kurdan kirine, lê, wek netewe û mafên netewî kurd nas nekirine, piranî di nava hin mafên biçûk de xwe nêzî gelê kurd kirine, çima?.

ji ber ku wan bi xwe, xwe ji eydolojiya fermî azad ne kirbûn.

5- pêngava herî rast ewe ku leşker xwe biguherin û dergehê demukirasiyê ji komarê re vekin:

Di serdema îro de bê ziman û rêbazê dîmokirasiyê arîşe nayêne çarser kirin, ji ber ku mirovayetî, aştî, birayetî, mafên xwe yên rewa û mafên jiyaneke dimokirasî di xwazin. Êdî dergehê şer û pevçunan hatiye girtin, dem dema çares kirina pirsgêrêkane, li gorî dîtina min, ger komara tirkiyê û serkêsê komarê artêsa tirkiyê li gorî vî çaxê nû nekvê nava bizavekê, wê aloziya xwe ya aborî, siyasî û peywendiyên xwe kûr bibe, ji ber vê çendê, pêwîste leşker dergehê guhertinê û nû bûnê ji cem xwe dest pê bikin. Pêngaveke wisa ji aliyê artêşê ve bê avêtin ev tê wateya ku yê tirkiya ber bi demokirasiyê ve biçe, ji bû vê pêvajoya demokirasiyê jî, biryara yekemîn, çareser kirina pirsgirêka kurd û vekirina deriyê tekoşîna siyasî li pêsiya gelê kurd li bakurê kurdistanê.

Bi helkefta vemirandina yekmîn mûma jiyê Hawar a nû xêzana kovarê pir ji dil pîrozbahiyên xwe arastey hemî xwendevan û nivîser û rewşenbîran dikê û hêvî dikê ko karîbûbê tiştekî ji hejî pêşkêş bikê, dîsan daxwazê ji hemî rewşenbîran dikê pişkdariyê di Hawar a nû de bikin jibo avakirina civakekî sivîl û demuqrat, her dîsan jî daxwazê ji xwendevanên hêja dikê têbînî û nerînên xwe li dor kovara Hawar a nû ji her aliyekî girêdayî bi kovarê ve bê, sersal li we pîroz bê

Xêzana Hawar a nû

25 –12 –2005

MEDYA Û BERNAMEVANÎ

Denız Dargul

A-BERNAME Û BERNAMEVANÎ:

Bername: Di nav pîlan program û sîstemek zelal de, rast dirûst li ser bingehek xurt a zanistî, agahdar û perwerdekirina civakê ye.

Bername, li ser bingehek xurt a çandî tê çêkirin. Di her bernamê de, peyamekê dide mirovan. Bi armanc, bername tên çêkirin. Eger di bernameyekê de, peyam ciyê xwe nebîne, tiştekî nede civakê, tenê wê wextê mirovan wenda bike. Bername, bûyerên di tarîtiyê de mane, eşkere dike. Hemû hewldanên xwe li ser bingeha zanistî û çavkaniyan radixîne berçavan. Bername, ji her aliyê ve dikare tesîrê li ser civakê bike. Taybet vehandina gotinan, têgihîştina ramanî-îdeolojîk destnîşan dike. Bi bikaranîna deng, baweriyê, dîmen hêza tesîrê û rastiyan nîşan dike. Gotin, hêza zanebûnê ye. Ji bo vê yekê jî, di bernameyê de, gotin ciyek girîng digre.

Bikaranîna dîksiyoneke baş, saxlemkirina piyek xurt ê bernameyê ye. Bikaranîna teknîkê, xemilandina balkêşiya mijarê ye. Bername, sîstema mejî, nasnameya kesayet çêdike û diyar dike. Bernameya ku ne li gorî çavkaniyên zanistî hatibe amadekirin, bêwate ye. Giyana bernameyê jî, peyama nûjeniyê ya îdeolojîk e. Di her bernameyê de, reş-spî, şev-roj, xweşik-kirêt, biçûk-mezin, hebûn-tunebûn, bindestî-serdestî, feqîr-zengîn, kirêt-bêxîret, birçî-têr, şer-aştî heye. Bername, di karê hêvîtiyê ango bêhêvîtiyê de, bi pêş de bixe.

Bernamevaniya ragihandinê, ku di destpêkê de bi nivîskî û bihîstinî hatiye destpêkirin, di heman demê de, di rewşa cuda de, derbas dibe.

Di dewletên pêşketî de, civak bi baweriyên çapemeniyê ve, jiyana xwe derbas dike. Êdî her kes di mala xwe de, bernameyan dibîne û ji xwe re dike tecrûba jiyanê. Civak êdî baş dizane ka di bernameyan de, çi peyam tên dayîn. Ka di bernameya ji wan re bûye mêvan de, nûbûnek çawa xûya dike, baş dizane. Pêşbirka di navbera bernameyên çapemeniyê de, hêza belavkirina îdeolojiyê jî zêde dike. Her wiha temaşevan, guhdarvan ango xwendevanên xwe

zêde dike. Çiqas hêza belavkirinê zêde dike, ew qas jî, dibe xwediyê gotinê. Ev gotin çi paşketî be, çi jî pêşketî be, bi vî rengî tesîrê li ser civakê dike. Civak, di bernameyan de, demên borî, hebûnên nû, kesên nûjen, deverên nû dibîne. Her wiha îdeolojiyek nûjen a felsefîk dibîne. Sîstema bernameyê, ji mêvan re dibe, sîstema jiyanê. Civak, bi vê sîstemê reng digre û ji bo gihîştinê dibe alîkar. Her wiha bername ji civakê re, hevalbendiyê dike. Êş û elemên wan, hêvî û daxwazên wan, parve dike û pêşiya wan vedike. Ji roj, hîv, sal û sedsalên borî, dersê derdixîne. Çanda paşketî ango demborî radixîne berçavan û ya hemdem û nûjen, destnîşan dike. Bername, çînên civakê digre berçavan û li ser wî esasî tê organîzekirin. Bi zarokan re zarok, bi jinan re jin û bi karkeran re karker, bi xwendekar re xwendekar û hwd.

Xaleke din ku pêwîst e di bernameyê de were berçavgirtin; Prensîbên wekheviya civakê ye. Wijdan û edalet: gihîştina bernameyê bi pêş dixe. Pirsgirêkên civakê bi awayeke azad, lêkolin dike û digihîjîne xwediyên wan. Ji siyasetê bigre, heta çandê, wêje, spor, dîn û hwd. digihîjîne guhdarvan û temaşevanan.

Bername, wek sîstema giyanê mirov e. Mirov û giyanê wî çawa bi sîstemekê kar dike, bername jî rastiya jiyana wî a do, îro û sibê şanî dide.

Bername nasnameya civakê ye. Kesê ku bernemevan be, pêwîst e xwediyê nasnameyeke xurt a çandî be, xwediyê bingeha sosyalî, edebî, fîzyolojî û îdelojîk a hemdem be.

B-BERNAMEVAN

Bernamevan: Ew kes e ke ji xwe re bername kiriye pîşe. Ji bo bernamevaniyê, hêzeke çandî û sosyalî tê xwestin. Her wiha tecrûbeya jiyanê gelekî girîng e. Di xwendegehên sîstemên desthilatdar de, çar salan li zanîngehan de dixwînin û piştre du salan stajê dikin, di dawiyê de jî bi ezmûna (îmtîhan) nivîskî û devkî, digihîjînin encamê. Piştî hewariyek xurt, dikşînin nava kar û xebatê. Di bernamevaniyê de perwerdeyên dibistan û akademî ne bes in. Ji ber ku li xwendegehan de, tenê bingeh tê dayîn. A herî girîng jî, xwe perwerdekirina kesayet gelekî girîng e. Bernamevan; pêwîst e li gorî xebata xwe, xwe perwerde bike. Taybet çînên civakê psîkolojiya mirovan, (kûl û azarên wan) soslojiyê, hebûna însan û mijarên wek civakbûn gelek girîng e. Pêwîst e benamevan li ser van mijaran xwe perwerde bike. Di xebat û têgihîştinê de, ji xwe re nasnameyekê diyar dike. Ev nasname ne ji bo xweperestiyê, ji

perwerdekirina civakê re bibe mînak. Di dema ku mirov dibêje nasname, pêwîst e stîla bernamevan were eşkerekirin. Bernameya bêstîl nikare xwe bi civakê bide qebûlkirin. Bêstîlî bêprogramî ye, bêsîstemî ye û encama têgihîştineke demborî ye. Eger stîla bernamevan li gorî nûjeniyê be, wê were qebûlkirin û biwate be. Bêîstîkrariya stîla bernamevaniyê, bêîstîkrariya benamevan e, bêîstîkrariya benamevan, stîla bêîstîkrariyê ya kesayet e. Bernamevan di encama têgihîştina kesê bernamevan de, rû dide. Çiqas xwediyê kûraniyê be, ewqas jî, xwediyê benameyek xurt e. Bernamevan, xwe bi armanc û hedefên xwe ve, kîlît kiriye. Di xebata bernameyê de, wê çi nûbûnê pêk bîne, wê çi ragihîna raya gişti, di nav heyecanê de ye. Hemû bernameyên alternatîf dişopîne, guhdarî dike û alternatîfeke nûjen diafirîne. Di warê pêşketina cîhanê de, agahdar e. Di warê teknîka modern de, agahdar e. Her tim di nav lêgerîn û hilkolînê de ye. Bêyî ku bisekine, dibe guh, çav û ramana civakê ya tendirûstî, hiqûqî, psîkolojî, perwerde, çand û muzîkê. Hemû mijarên ku mirovan eleqedar dike, bi zîmanekî zelal radigihîne. Yanî pêwîstiya herî mezin a guhdarvan û tamaşevan bi zimanek zelal heye. Eger zimanê bernamevan xweş û zelal nebe, ew peyama ku pêwîst e wê nikaribe bide. Ji bo vê yekê pêwîst e bernamevan zimanê ku pê bernamê çêdike, baş bi kar bîne. Yanî weke zimanzanekî hakîmiyeta wî li ser ziman heye. Xwediyê dîksiyoneke balkêş e. Hemû dengê pêwîst û (Eger ew bi kar neyine jî) bizanibe. Xwediyê têgihîştineke sîstematîk e. Di warê gihîştinê de, hebûna wî ya ehlaqî-edebî jî derdikeve holê. Bernama wî/ê, li ser esasê îdeolojîk-polîtîk û felsefeyeke xurt pêwîst e were çêkirin. Ji ber vê yekê, lazim e bername li ser xeteke îdeolojîk were amadekirin. Yanî pêwîst e xeta îdeolojîk û siyasî temsîl bike.

Di rojnamegeriya radyo û tv, agahî û xeber û danezanîn de, zimanê gelêrî ango zimanê axaftinê tê bikaranîn. Li ser vî esasî, bernamevan xwe amade dike. Bi nêzîkbûneke hevaltî, dostanî lê, zimanekî hêsan bi kar tinê û nêz dibe.

Bernamevan, ew kes e ku, bi awayekî rast, çi rojane be, yan jî mehane, çi bi nivîskî be, çi jî bi rêbazên dîmenî, vebihîstinî li ser bingehek peymanî, bi awayeke zelal, bikaranîna nûçe, ragihandin û eşkerekirina fikrên cur be cur e. Ango lêkolîner, hilkolînêr û têkoşerê rastiya gerdûnî ye. Gelo taybetmendiyên bernamevan çi ne? Pêwîst e li ser kîjan esasan kar bike:

a-Meraq: Eger kesayetek rojnamevan ne xwediyê meraqê be,

nikare vê xebatê bimeşîne û daxwazên xwe pêş bixe. Bernamevanî jî, mertebeyek xurt a têgihîştina rojnamegeriyê ye. Eger tu rojnamevanek baş bî, tu dikarî bibî bernamevanek baş. Asta herî bilind û binavûdenk jî bernamevanî ye. Ji bo xwe gihandina vê mertebeyê jî, meraq roleke girîng dileyize.

b-Xwestek: Pêwîst e mirov ji bo vî karî bi dilxwazî tev bigere, da ku girêdana ji bo serkeftinê bi pêşkeve. Xwestek, bi zanebûna însan ve girêdayî ye. Eger zanebûna te tune be, zanebûna te di mertebeyek xurt de nebe, ji aliyê siyasî, çandî û edebî ve, xwe perwerde nekiribe, nikare xwesteka xwe pêş bixe. Kar û xebat bi xwestekê ser dikeve û dibe malê civakê.

c-Girêdan-Tutqû: Pêwîst e mirov bi karê xwe ve girêdayî be. Di warê serkeftina karê xwe de, bibawer be. Xwediyê îmanek xurt a pêşketinê be.

Girêdana kar, mirovan hinek din nêzî serkeftinê dike. Eger tu bi karê xwe ve girêdayî bî; wê bikarî kûrbûnekê çêbikî. Her wiha dewlemendiyek baş pêş bixî. Ev yek kar dewlemendtir dike, fantaziya îro kûr dike. Dewlemendiya xebatê dixemilîne. Her wiha rêjeya gotûbêjan vedike xebatê dewlementir dike.

d-Xwebawerî: Kesê ku ji xwe ne bawer be, ango îmana wî qels be, wê nikari be, demek dirêj bimeşe. Di karekê de, ti tiştek mirovan tune be, belkî xeterî nebe. Lê dema her tiştê mirovan hebe, lê îman, bawerî qels be, xeterek mezin e. Di karekê de, çi dibe bila bibe, pêwîst e mirov xwe ji bo kar bibawer bike. Bawerî, bingeha her tiştî ye. Eger ev yek di mirovî de xurt be, wê zanebûn, nêrîn û têgihîştina rast jî û girêdanê xurtir bike. Gihîştina kesayetî, gihîştina bernamê ye, gihîştina bernameyê bixurtkirina baweriyê ve gengaz e. Bawerî sebra serkeftinê zêde dike.

e-Sebir: Di xebata bernameyê de ango taybetiyeke girîng a bernamevaniyê sebir e. Sebir bi xwe re têgihîştinê tîne. Tîştên nû diyarî te dike, di giştî rojnamevaniyê de piyek herî girîng, sebir e. Eger tu di karê bernamevaniyê de, bi sebir tev negerî, wê ziyanê bide piyên din jî. Sebir gihîştina mirov destnîşan dike. Bername jî bi sebrek dewlemend ve, digihîje serkeftinê. Bawerî sebrê, sebir jî, rast bikaranîna wext nîşan dide.

f-Wextzan: Di kesayetê bernamevan de, taybetiyek heye, ew jî di nav pîlan û programek xurt de dizane wextê xwe bi kar bîne. Wextê xwe yê vala bi afirandêriya xwe ve, tijî dike. Di jiyana mirovan de, wext zû derbas dibe. Pir caran wextê mirovan vala diçe. Pir kêm mirov hene ku wextê vala bi afiradêriyê re tijî dikin. Bi taybet bernamevanî xwediyê wê derfetê ye ku her deqîqe,

saet rojên xwe tijî derbas bike. Derfetê wê/î yê geriyanê jî hene. Her serpêhatiyek wî ji bo paşerojê tecrûbeyekî jiyanê pey xwe bihêle. Taybet bernamevan di der barê wextê vala de, bi vî rengî tijî bike û di xebata paşerojê de, bi kar bîne.

g-Nûxwaz: Bernamevan, ti car berhemên ku hatine çêkirin bes nabîne. Her tim li tiştê nû digere. Li hemberî dîrokê xwe berpirsyar dibîne. Tiştên hatine afirandin dizane û yên nû diafirîne. Mirovan li ser hebûna dîrokî kûr dike û seferberî xebatê dike.

h-Kûr e: Di her warê jiyanê de, xwe perwerde kiriye. Di warê çand, huner, civakî de, pêşeng e. Her wiha dîtin û ramanek zanistî ji xwe re esas digre. Kûrbûn bi xwe giraniyê tine. Eger kesek kûr nebe, wê nekaribe bernameyek têgihîştî, giran çêbike. Kûrbûn, pîlan, proje û vehûnandina bernamê bihêz dike û heyecanê zêde dike.

i-Bicoş e: Bernamevan her tim di nav coş, heyecan û moralek mezin de dixebite. Coşa wî, hevkaran xurt dike, xwestek û heyecana kar zêde dike. Ji aliyê psîkolojik û sosyolojîk ve jî moral dide civakê. Coşa mirov sembola hêza baweriyê ye. Ji karê ku tiştek nû diafirîne zewq digre. Ev helwesta wî hêza wî ya li hemberî kar zêde dike. Çiqas biafirîne ewqas jî coşa wî/ê zêde dibe. Coş kêfxweşiya li hemberî kar zêde dike. Ev yek jî hêza bikaranîna înîsiyatîfê zêde dike.

î-Biînîsiyatîf e: Bernamevanî tenê di nav çar dîwaran de, nayê meşandin. Li gorî pîlan, program û projeya bernamê bi mehan li der ve dimîne. Hin caran ti kes jî derdora te tune ye. Hemû biryarên baş û xirab tu bi serê xwe didî. Ji bo vê yekê înîsiyatîfek rast û dirûst li ser esasê xetek îdeolojîk, polîtîk û armancên civakê, pêwîst e were bikaranîn. Lê dema ku înîsiyatîf tê bikaranîn jî, pêwîst e berpirsyariya siyasî jî bigrî ser milê xwe. Ji ber ku her înîsiyatîf jî, ne rast e, bikaranîna înîsiyatîfek xirab encamên nebaş pey xwe dihêle. Beriya her tiştî baweriya li hemberî hev dişkîne, pêwîst e înîsiyatîfek rast li ser esasê zanistiyê were pêkanîn. Însiyatîfa rast jî bi têgihîştina rast ve girêdayî ye.

j-Kolektîf e: Xebata bernamevanî bi rêbazên xweserî ve nayê meşandin. Bernamevan xwediyê kurgu sazkariya bernameyê ye. Ji bo vê yekê pêwîst e ne kevirek sivik be, kevirek giran be. Gihîştî be. Gotina ji lêvê derdikeve bernameyê temsîl bike. Tiştê ku dixwaze çêbike ne bi rêbazên xweserî, bi pirskirin û parvekirina, bi hevalên derdora xwe ve, parve dike. Ev helwest hêrsa hevkariyê zêde dike. Di xebata çapemeniyê de, ji ber pêwîstiyên teknîkî pêwîst e kar bi awayeke kolektîf were meşandin. Eger hest û têgihîştina kolektîf di kesek

rojnemevan de, tune be, wê nekarîbe bernamê çêbike. Di vê xebatê de, dîtin, proje û zanebûn têr nake. Ka bi derdorê re çawa kar were meşandin, gelek girîng e. Ji bo serkeftinê başî û xirabî tên parvekirin. Serkeftina xebata ekîbê, serkeftina bernamevan e, serkeftina bernamevan serkeftina hemû koma hevkaran e. Yanî ekîp bi hev re, baş û xirabiyan parve dikin û hemû xwediyên îradeyê ne.

k-Bicesaret e: Ji bo serkeftina bernameyê cesaret xalek gelek girîng e. Cesaret, bizanebûnê ve girêdayî ye, eger bernamevan xwe li ser bingeheke zanistî xwe perwerde kirîbe û xwediyê îmanek xurt a armancên xwe be, dikare serkeftinê bi dest bixe. Hemû xalên ku li jor hatine nivîsandin bingeha cesaretê ne û bi hev re girêdayî ne. Eger cesaret di kesayeta bernamevan de tune be, wê nikare be xalên li jor jî pêk bîne. Rojnemevan bi her kesî re dide û distîne. Di karên rîzîko de, cî digre. Di nav zor û zehmetiyan û talokeyan de, kar dimeşîne. Di warê çêkirina pêwendiyan de, xwediyê gotinên bicesaret e. Ji bo serkeftina kar hîç astengekê nas nake.

l-Dîplomat e: Her bernamevan dîplomat e. Di warê danûstandinê de uslûp û terz de, têgihîştina dîplomatîk baş fêm kiriye. Di vê xebatê de eger têgihîştinek dîplomatîk neyê pêkanîn, wê hîn zor û zehmetiyên jiyanê derbikevin pêşberî xebatê. Bernamevan, gelek pêwendiyên wî bi radeya herî mezin tên çêkirin. Ji bo vê yekê hişyar e, rûken e gotina xwe dizane. Her wiha îstixbarata cîhanê jî dişopîne.

m-Hunermend e: Bernamevan, ji huner û hunermendiyê fêm dike. Her wiha artîstek baş ê pîşeya xwe ye. Dikare rola şanoyê di bernameya xwe de, baş bileyize û bandor li ser xwendevanan, guhdarvan û temaşevanan bike. Bi têgihîştina xwe ya kûr hêz dide huner û hunermendiyê. Her wiha xwediyê dîksiyonek baş e. Dikare hemû cureyên dengan derxîne.

Rojnemevanî pîşeya herî bilind û xurt a cîhanê ye. Bernamevanî jî mertebeya wê ya herî bilind a pratîk e. Pêwîst e, di hemû zanyariyan de xwediyê zanebûnê be. Di warê huner, psîkolojî, sosyolojiyê de jî pêwîst e xwe perwerde bike. Bernamevan pêwîst e, aborî, sporê siyaset û çandê jî bişopîne û xwe perwerde bike. Mirov dikare taybetiyên pêwîst ên bernamevanekê/î wiha rêz bike, ku li jor hatine destnîşan kirin.